“Rayedarên Turkiyê ji tirsa Muhafizekaran pêngavên kîselî davêjin”

•••»3

“Bizûtneweya Îslamiya Kurdistanê 7 pêşmergên PDKÎ radestî Îranê kirin”

•••»4

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

AGIRÎ

PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşan a Kurdistana Îranê lihev civiyan

Heyetên her du aliyan bi serkokatiya Rêzdar Mistefa Hicrî û Rêzdar Ebdulla Mohtedî di civînaxwe ya 21’ê Çiriya Pêşîn de, li ser dawî guhertinan bas û gengeşe kirin.

Basa herî giring rewşa niha ya Îranê û çend mijarên pêwendîdar bi herêm û cîhanê bû. Her du aliyan pêdagirî li ser alîkariya zêdetir û girtine pêşê ya riyên hewce derheq guhertinan kirin.

Duheftînameyek Siyasî-Gistî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (216) 22-10.2013 Buha (150) Tûmen

10’ê Octoberê roja cîhanî ya xebat li dijî cezaya darvekirinê

•••»5

Urmiye û xwestekên şovenîstî ên hinek kesan

•••»6

xebt û tekoşîna pêşmergê kevnar ê PDKÎ, Mamosta Qadir di Agirî de bixwînin

•••»8

Yarsanî bûne goriyê sozên Rûhanî

Hêzên Ewlekariyên ên Îranê pêşiya birêveçûna meşa nerazîbûnê ya peyrewên olê Yarî li hemberî avahiya parlêmênta rejîma Îranê de girtin, û gellek kes jî destbiser kirin.

Piraniya meşvanên Kurd ên peyrewê ayînê Yarsan, ji bajarên Kirmaşan, Îlam û Qezwînê ve ber bi Tehranê çûbûn.

Di nava girtiyan de du birayên Nîkmerd Tahirî jî hene ku navbirî di 05.06.2013’an de bi nîşaneya nerizayetiya li hemberî siyasetên dijminkarane ên rejîma Îranê li hemberî Yarsaniyan agir berda leşê xwe û canê xwe ji dest da.

Kurdên Yarsanî siyasetên pirr ji ferq û cudahî û serkutê ji aliyê rejîma Îranê ve bi tundî rexne dikin.

Sergotar

Tepeseriya Kurd-ên Yarsan

Şehab Xalidî

Meşa nerazîbêna ya Kurdên Yarsan li pêşberî parlemênta rejîma Komara Îslamî ya Îranê, rastî tepeseriyê hat, û gellek ji wan meşvanan hatne girtin.

Di meha hezîrana îsal de jî du Kurdên Yarsanî wekî gazinde û rexnekirina siyasetên dijminkarane ên rejîmê derheq bi peyrewên ayîna Yarsan agir berdane leşê xwe û mixabin dawî bi jiyana wan hat.

Yarsanî jî wekî kêmaniyên din yên olî di heyamê zêdetir ji 30 salî deshilatdariya vê rejîmê de ketine ber zulm û zorî û ferq û cudahîdanînê, û berdewam li jêr çavdêriya hêzên ewlehiyê de bûne.

Bi fermînasîna tenê mesebekê wekî mesebî fermî yê welat rê ji bo bêhurmetîkirina bi peyrewên ol û mesebên din ji aliyê rayedarên rejîmê ve xweş kiriye, û bi vê siyasetkirinê ew hizr û îdeya helandin û kêmrengkirina ol û ayînên din dimeşînin.

Lê bi xweşî ve em dibînin ku ew siyaseta şaş û dijminkarane hertim rastî nerazîbûna gelên zulmlêkirî ên Îranê hatiye û pêpkên deshilata lerzok a rejîmê hejandine.

Lewra serkut û zordariya li dijî Yarsaniyan jî her çend tund û hovane be, ne tenê nikare dengê Yarsaniyan di geviyê de bifetisîne, belkû wê hesta berxwedan û berbirûbûnê di hundirê wan de, bihêztir bike. Bêguman piştevanîkirina ji Yarsaniyan di vê qonaxa hestiyar de, erkeke neteweyî ye, û dikare rejîmê neçar bi paşekêşê bike.

Raporek derheq çûna Sehrarûdî bo civîna jinêvê

Piştî çûna Sehrarûdî bo Ewropayê, polîs û dezgehên pêwendîdar ên navdewletî ji aliyê PDKÎ ve hatin agehdarkirin.

Piştî agehdarkirina serdana Mihemed Ce'fer Sehrarûdî li welatê Swîsê nûneratiya PDKÎ li derveyî welat çendîn nûnerên parlemento û endamê hikûmeta Swîsê ji serdana vî bikujî aghedar kirin.

Sehrarûdî ku navê xwe guheriye, û navê xwe kiriye Mihemed Ce'ferî, bi tawana terora Dr. Qasimlo û hevalên wî ji aliyê dadgeha bajarê Viyenê ve hukmê girtina wî hatiye dan, lê ew hukm heya niha jî radestî Înterpolê nehatiye kirin.

Sehrarûdî ji 3 heya 9'ê Octobera 2013'an di civîna bajarê Jinêv, civîna parlemanterên cîhanê de beşdar bû, û nûneratiya PDKÎ jî bilez polîs û dezgeha dadweriya Jinêvê û polîsê federal agehdar kir, û li dijî çûna Sehrarûdî bo vî welatî sikalaya yasayî kir.Herweha derheq çûna Sehrarûdî bo Jinêvê, gellek rojnameyan mijar û rapor û nûçr bilav kirin.

di vê derheqê de Heftenameya Siyasî a binav û deng ya Otrîşê babetek bi navê "Sûçdarê serekî yê terorê Kurdan li Viyenê bê pirsgirik rizgar dibe", bilav kir ku di beşeke vê mijarê de hatibû: Sehrarûdî bi sûçê terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî, 24 sal berî niha li Viyenê, hukmê destbiserkirina navdewletî jêre hatiye birrîn.

Navbirî çend rojan berî niha li gel heyetekî parlemana Îranê hetibûne welatê Swîsê, lê karî bi bê pirsgirk vî welatî bi cî bihêle.

Di rastî de rêxistinekî binav û deng weke Yeketiya Navdewletiya Parlemataran bo vê nabe ku di pêwendî li gel kuştina mirovekî de navê vî bihê, lê vê carê yek ji nûnerên beşdarê konferansa vê rêxistinê, navê tawanbarekî tê, ku derheq kuştina sê Kurdan li Viyenê de, hukmê destbiserkirina navdewletê jêre derket. Ev kese jî navê wî "Mihemed Ceiferî Sehrarûdî" ye.

Herweha rojnameya "Die Tages Zeitung" ya Almanî jî derheq serdana Sehrarûdî bo Jinêvê weha nivîsand: "Sehrarûdî piştî terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li Viyenê karî di nav Sipaha Pasdaran a Îranê de, postên bilind wergire, û bibe jineral. Piştre di sala 2007'an de hêzeke taybetî ya Amerîkayî hewla girtina navbirî li bajarê Hewlêrê de da ku serkevtî nebûn.

Wê demê ew cihgirê Elî Larîcanî berpirsê Konseya Ewlehiya Neteweyî ya Îranê bû. Piştre ku Larîcanî bû serokê parlementoyê Sehrarûdî kire berpirsê nivîsîngehaxwe.

Gelo paketa demokratîk li Turkiyê çareserî ye

Rostem Cehangîrî

Her weke haydar in, di Newroza 2013'an de û piştî belavbûna nameya rêzdar Ocalan rêberê hepskirî yê PKK'ê, qonaxeke nû ji xebata tavgera Kurd li Kurdistana Bakûr derket holê.

Wusa dihate xuyakirin ku hindek mijarên peywendîdar bi pirsa Kurd di navbera Ocala û dezgeha hevalgiriya Turkiyê (Mît) de hatibûn gengeşekirin û hindek biryar hatin dayîn. Hekî em lê binêrin di demeke kêm de piştî belavbûna nameya Ocalan, bêy yek û du, ji aliyê PKK'ê ve agirbesata yek alî hate ragehandin, û piştre dest avêtin vekêşandina hêzên xwe ji Kurdistana Bakûr ber bi Kurdistana Başûr.

Şer li Bakûr sekinî û eva heyamê salekê ye ku şer tune ye, û êdî termê gerîla û eskerên Turk bo nava bajar û malbatên wan nahên vegerandin.

Eva jî digel pêşwaziya gelê Kurd û partiyên din berbirû bû, heta ji aliyê cîhana derve wate YE, Amerîka û welatên din jî hat pêşwazîkirin, heya niha her tiştek bi başî û di cihê xwe de birêve çû. Di vir de pirsyarek derdikeve holê ku gelo pirsa Kurd çi bi ser de hat? Li Kuderê wê bas ji çareseriya pirsa Kurd bê kirin?

Eva û gellek pirsyarên din ku me di dema xwe de û di helwêsta PDKÎ de ragehandin û hindek ji wan jî heta bi dilê hevalên me li Kurdistana Bakûr nebûn. Lê niha ev pirsyarên ku salekê berî niha me dikirin, rêberên PKK'ê dikin. Hevalên PKK'ê gellek bas ji çareseriya demokratîk dikirin, lê tu caran kakila wê eşkere nedikirin û tenê bas ji çend mijarên weke:

1. Bêtirkirina cihê jiyana rêberê wan Ocalan û yan jî serbestberdana wî
2. Serbestberdana girtiyên KCK'ê
3. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî yan Kurdî
4. Anînexwarê ya barajê, yan astenga ser rêya hilbijartinê

Eva xwastekên aliyê Kurd bûn.

Di hember de jî dewletê ragehand ku tevî PKK'ê rûniştin çê nabin heta çekên xwe nedanên û axa Turkiyê bi cih bihêlin, wî çaxî wê pirsa çareseriyê dest pê bike. Piştre bi piropagendeyeke zaf hat îlankirin ku paketa demokratîk wê bê ragehandin. Piştre paket hat îlankirin û kakila wê jî hat eşkerekirin. Bendên ku di paketê de hatibûn, li gorî xwastekên Kurdan û nirxa ku jêre hatibû dayîn, û bona çareseriya pirsa PKK'ê pir kêm bûn, lê berevpêşçûn di pirsê de tê mêzekirin.

Di nava paketê de benda herî girîng nehêlana sirûda "Ez Turk im" di xwendingehan de rakirin ku ew yek guhertinek mezin di felsefeya avakirin dewleta Turki da bû, her çend ew yek biberçaw kêm xoya bike lê girîng û bi bandûre. ya din jî baraja hilbijartinê ye. Bi hizra min di vir de Erdoxan bêhnfirehiyek zaf ji xwe nîşan daye, dibêje bibe %5 û yan jî her nemîne.

di rastî de divêt ew du pîşniyar wate bibe %5, yan jî her nemîne, bi qazancê kurd e, hekî eva cîbicî be û bibe yasa, eva pêşkevtinek mezin e di sîstema hilbijartina Turkiyê de, ji ber ku eva astengeke mezin bû li ser riya Kurdan û Kêmaniyên din di hilbijartinan de, li welatê Turkiyê.

Paşan xwendina bi zimanê zikmakî di qonaxa lîseyî, yan paş nawendî, di xwendingehên taybetî de. Li vir de eva ku Kurd dixwaze û heqê wê yê rewa ye, xwendina bi zimanê zikmakî ji despêkê heya qonaxên herî bilind e, lê mixabin me dît ku ev mijara girîn cardin hate paşxistin. Yan guherîna navê bajar û gundên Kurdistanê ku dema xwe dewletê hewil dida bi vî awayî demografiyaya Kurdistanê biguhere, lê di vê pîlana xwe de serkevtî nebû.

Ev xalên ku ketin ber bas û gellek tiştên din ku di paketê de hatibûn, gellek baş bûn û pêngaveke erênî ye, û Turkiyê di demokratîzekirinê de hindek din dibe pêş û hêdî hêdî Kurd jî dibe ji rêyên yasayî ve bigîjin mafên xwe. Eva ku li vir hecwe û cihê rexne û gazindeyê ye li rayedarên Turkiyê, eva ye ku hêj ji fikriyet û hizrên şovênîstî derneketine.

Nikarin bi xwe bidin selimandin ku dibe Kurd jî weke neteweyeke cuda ji Turkan e bijîn, û maf û azadiyên wan bi awayekî fermî bên dayîn, û weke bira bi hevre jiyana xwe bidomînin, û dujminatiya bi sedana sale ya di navbera gelê Kurd û Turk de bi dawî bînin û bibin welatekî bihêz ku bandora wan di herêmê de hebe.

Çend gotinek tevî PKK'ê û BDP'ê û derdorên wan, gotineke pêşîn ya Kurdan heye ku dibêje "Te di nava şoyê de dorandiye, û niha di nav coxînê de daxwaz dikî".

Hevalno!
Niha hewce ye ku hûn dirêjiyê bi agirbestê bidin û bi tu awayekî destan bo çekan nebin. Zext û givaşa di çarçoveya yasa û pîvanên Demokrasiyê de bibine pêş, wusa hûn wê roj bi roj zêdetir nêzîkî xwastekên xwe bibin, û zûtir û bêtir hûn wê di nava neteweya Turk û neteweyên din ên derdorê de dost û alîgiran bo xwe û tevgera Kurd peyda bikin.

Tiştek din ku aliyê Kurd bi taybetî PKK û BDP nabe ji bîr bikin, ev e ku xwe ji bikaranîna zimanê tirs û gefê biparêz in, û bas ji şer nekin. Bi baweriya me û gellek şirovekarên mijarên siyasî, vê carê di herêmê de şer bi qazancê tu aliyekê nabe, û heya bi zerera her du aliyan e, bi taybetî aliyê Kurd. Jiber ku di nava Turkiyê de zaf in evên ku niha jî dijatiya çareseriya pirsa Kurd û demokrasiya di nava Turkiyê de dikin.

Eva ku rayedarên Turkiyê pêngavê kîselî davêjin, hindek ji tirsa mohafizekarên nava sîstema Turkiyê de ye, jiber ku gellek çalak in û dixwazin bi giştî vê pirojeyê bisekinînin.

Ji aliye din ve jî, pêşkevtinên Kurd di herêmê de baş in, bo mînak li Turkiyê pêşkevtinên baş bi dest hatine, lê kêm in, li Sûriyê derdorên Kurdan hêdî hêdî rizgar dibin, lê gef û êrîşên li ser wan zaf in.

Êrîşên hêzên terorîst bi piştevaniya dewletên herêmê û gellek aliyê din ên derdora Kurdan. Lewra neyarên Kurdan li derfetê digerin ku êrîşên xwe bo ser Kurdan zêdetir bikin. Jiber ku guherînkariyên ku li herêm û welatên ku axa Kurdistanê dagîr kirine tên çavnihêrîkirin, bi qazancê Kurd û bi zerera wan dewletan in.

Lewra gereke em vê yek baş fam bikin ku, nabe em nerehet bin û derfetan bo dujminên xwe bidin afirandin da ku êrîşên xwe bo ser deskevtên me zaftir bikin. Hekî em hişyar bin, derfet û guherînkariyên gellek baş bona Kurdan tên çavnihêrîkirin da ku xewnên bav û kalên Kurdan êdî bibin rastî û Kurd bigihîjin hêviyê xwe.

Bîranînek ji 7 xebatkarên demokrat û goriyên berjewendiyan

Kawe Behramî

PDKÎ bi dirêjahiya xebat û tekoşîna xwe ya berdewam di pêxema gehîştina bi berjewendiyên neteweyî – demokratîk ên xelkê Kurdistanê, berjewendiyên bilind ên neteweya Kurd li tewahiya parên Kurdistanê, li serweyî her cure berjewendiyeke teybetî û hizbî ên xwe daniye û di vê pêxemê de jî, amadeyî her cure cangorîtî û qurbanîdanekê bûye.

Eva ku li vir cihê hûrbîniyê ye û di vê kurte basê de ez dixwazm îşarê pê bikim, bîranînek ji 7 xebatkarên PDKÎ ye, ku di 28'ê rezbera sala 1375'an (Çiriya Pêşîn a sala 1996'an), bi awayekî neberpirsane û dijî pirensîpên mirovtewer û neteweyî, ji aliyê Tevgera Îslamî a Kurdistanê ve radestî Komara Îslamî hatin kirin.

Hewraman li her du parên Kurdistanê (Rojhilat û Başûr) hertim qada xebat û berxewedan û qurbanîdanê bûye, xelkê vê devera xweşik a Kurdistana Îranê, piştevanê xebatkarên demokrat bûne, û ji her derfetekê ku karîbin bi şikoyeke çiyayî, mertala berevanî ji man û hebûna neteweya xwe bûne.

Piştî şoreşa gelên Îranê, devera Hewranamê bi dirêjahiya çendîn salan, cihê heviyan û bêhnvedana kadr û pêşmergên PDKÎ bûye, û gellek caran xebatkarên Kurdistana Başûr jî, di derfetên cur bi cur de bê arîşe û pirsgirêk bi hevre jiyane û, heta gellek caran bi awayekî piraktîkî di rewşên taybet û cur bi cur de jî, xelkê vê deverê û xebatkarên demokrat, hevkar û piştevanê parên din ên Kurdistanê bûne û, di hember de çavnihêriya tu destxweşî û padaşekê ji wan nebûne û li ser hisaba xûşk û birayên beşên din ên Kurdistanê, hewla berevpêşbirina xebata Kurdistana Rojhilat nedane û tu caran sitratijî gorî berjewendiyên biçûk û taktîkên rojê nekirine.

Bi liberçavgirtina vê ku devera Hewraman bi salan li jêr hêjmûniya hêza xwedîhêz a Şaho a PDKÎ bûye, gellek caran hêz û aliyên siyasî ên Kurdistana Îraqê jî ber bi vê deverê dihatin û ji aliyê xebatkarên demokrat ve derfetek bo tewahiya parên Kurdistanê çê dibû, da ku tev alî bi awayekî dostane riftarê tevî hevdu bikin.

Hesta pak û welatparîziya xebatkarên demokrat, û bi liberçavgirtina derbazbûyiya kar û xebata hêz û aliyên Kurdistanî, di 28'ê Rezbera sala 1375'an (1996) de, parek ji pêşmergên PDKÎ piştî vegeriyan ji Hewramanê, li gundê Eneb a ser bi bajarê Helebçê, ber bi baregeheke Tevgera Îslamî a Kurdistanê diçin û, endamên tevgerê bi serperestiya Enwer Enebî, ji niyeta pakiya xebatkarên demokrat mifahê werdigirin û bi hêceta vê ku di rê de mandî bûne û dibe bona bêhnvedanê heyamekî kurt li cem wan bimînin û piştî bêhnvedanê dikarin ber bi baregehên xwe bikevin rê.
Xebatkarên demokrat jî herçend bi guman ve ji vê pêşniyara wan dinêrin, lê pêşniyara wan qebûl dikin, û mixabin ji sat û sewdaya Tevgera Îslamî û Komara Îslamî ya Îranê haydar nebûn.

Tevgera Îslamî pêştir pîlana îxaneta han tevî Komara Îslamî darêtibû, ev pîlana dijî mirovî û dijî neteweyî piştî amadekirina tewahiya rê û îmkanatên hewce bû sedema vê ku piştî çend demjimêran, 7 xebatkarên demokrat wate Erşed Rizayî, Mihemedezîz Qadirî, Daryûş Îslamdûst, Yûnis Mihemedpûr, Mozefer Kazimî, Ednan Îsmaîlî û Me'rûf Sohrabî bi Sipaha Pasdarên Komara Îslamî li bajarê Pawê hatine tehwîldan.

Bi vî awayî Tevgera Îslamî derheq bi netewa Kurd li Kurdistana Rojhilat û PDKÎ, tawana herî mezin encam da û ew tawan tu caran nahê jibîrkirin.

Wî çaxî Deftera Siyasî a PDKÎ di daxuyaniyekê de serbarê haydarkirina bîr û raya giştî û kom û komelên mirovdost, hişdarî dane Tevgera Îslamî û Komara Îslamî, û daxwaza parastina canê wan xebatkaran kir.

Tevgera Îslamî haşa ji beşdarî di kiryareke weha qirêj û dijî neteweyî de kir. Di dawiyê de PDKÎ karî di pilaneke darêtî de yek ji wan xebatkaran bi navê Daryûş Îslamdûst ji girtîgeha Komara Îslamî rizgar bike û, bi derbazbûna wî bikerên vê pîlana dijemirovî bi taybet Tevgera Îslamî ji bîr û raya giştî re hatin eşkerekirin.

Eva ku di vir de bo tev aliyekê eşkere ye ev e ku, ji aliyekê em dibînin ku siyaseta dirust û rast a PDKÎ di tewahiya qonaxan de, rê nedaye ku li ser hisaba Kurdên beşên din ên Kurdistanê, tevî rejîmên herêmê sat û sewda bê kirin û ji aliyê din ve, Tevgera Îslamî a Kurdistanê kesekî weke Enwer Enebî serbarê vê cinayet û îxaneta ku derheq bi gelê Kurd li Kurdistana Rojhilat kiriye, dike berbijêrê parlemênta Kurdistanê? Gelo dibe dadperwerî û îdalet li kuderê be?

Di cih deye ku li gorî tewahiya pirensîp û yasayên navnetewî, berevankarên mafê mirov, dûreçûnê bo vê kêysê bikin û bikerên vê di dadgeheke dadperwerane de bigehînin cezaya karê xwe.

Nerîna Lîderan

Mesûd Barzanî:

“Ya girîng ew e ku dewleta Kurdî bê avakirin”.



Davûdoxlu:

“Tirkiye ne li dijî Otonomiya Kurdên Sûriyê ye”.

Nebîl Fehmmî:

“Her têkçûnek li pêwendiyên di navbera Mîsr û Amerîkayê de, bandora nerênî li ser tewahiya Rojhilata Navîn dadinê”.

Elsîsî:

“Artêşa Mîsrê digel şerê paropagendeyî û direvan berbirû bûye”.

10’ê Octoberê roja cîhanî ya xebat li dijî cezaya darvekirinê

Arif Vêlzî

Sala 2002’an rêkxirawên “Lêborîna navnetewî” û “lihevhatina cîhanî li dijî cezaya darvekirinê” bi merema nehêlana cezaya dijî mirovî ya darvekirinê, 10’ê Octoberê (10’ê Çiriya pêşîn) weke roja cîhanî a xebat li dijî cezaya darvekirinê diyarî kir.

Piştî derbazbûna pitir ji 10 salan bi ser diyarîkirina vê rojê, em dibînin ku bi xweşî ve herçend di gellek welatên Rojavayî û pêşkevtî de, pitir ji çend dehik e ku cezaya darvekirinê nahê birêvebirin, lê di encama hewl û mandîbûnên rêkxirawên berevanê mafê mirovan li seranserî cîhanê, niha di 97 welatên cîhanê de bi awayekî yasayî cezaya darvekirinê ji holê hatiye rakirin û herweha bi sedema givaşên navxweyî û derekî, bi awayekî piraktîkî di 36 welatan de jî cezaya han hatiye sekinandin û di 8 welatan de jî, cezaya darvekirinê tenê bo tawanên pir giran tê diyarîkirin, bi giştî di cîhanê de tenê di welatên Îran, Çîn, Amerîka, Erebistan û 27 welatên din, serbarê nerazîbûnên zaf ên navxweyî û civaka cîhanî, hêj cezaya han birêve diçe.

Deshilatdarên Komara Îslamî her di despêka dizîna berhem û samanên şoreşa gelên Îranê, mêtoda darvekirinê bona tirsandin û jinavbirina cudahizrên xwe, kire serhêla siyasetên xwe ên binajoxwaz. Lewma me dît ku di komkujiyên dehika 80’î ya Zayînî de, bi hezaran xortên bêtawan ên gelên Îran bi kindirê cehl û nezaniyê xendiqandin.

Birêvebirina vê siyasetê bi awayekî sîstimatîk û darêtî li jêr navên cur bi cur bo jinavbirina çalakên siyasî û civakî ji aliyekê û ji aliyê din ve, darvekirina zarokên bin 18 saliyê û darvekirina li cihên giştî û li ber çavên xelkê, bûye sedema vê yekê ku Komara Îslamî bi liberçavgirtina nifûsê, di pileya yekemîn a cezaya darvekirinê di cîhanê de cih bigire.

Eva ku cihê hûrbîniyê ye ev e ku, piştî pêkanîna hikûmetê ji aliyê Hesen Rûhanî ve ku bi dewleta “Tedbîr û hêviyê” dihat pênasekirin, gellek kes û alî liser vê baweriyê bûn û niha jî her li ser vê baweriyê ne ku, Îran ber bi demokratîzebûnê ve diçe û wê guherîn bi ser siyasetên wê li ser asta navxweyî û derve de bê, lê berevajî derket, û me dît ku tenê di 2 heyvên despêka avabûna dewleta “Tedbîr û hêviyê” de, pitir ji 140 kesî di girtîgeh û cihên giştî de hatine darvekirin û eva jî vê rastiyê diselimîne ku, kindirê kujer yê darvekirinê di Îranê de, tenê bi jinavçûna Komara Îslamî û cudahiya ol û dewletê di çarçoveya deshilata siyasî a Îranê de, ji Cerseqîlê û di odeyên îdamê û di pişt mîleyên yarîgehên werzişî de, wê bê xwar.

Urmiye û xwestekên şovenîstî ên hinek kesan

Keyhan Yûsifî

Hinek caran divêt rewşeke weha pêk bê da ku nasnameya rastîn ya hinek kesan, yan aliyan eşkere be, yan bi gotineke din rûyê xwe yê rastîn eşkere bikin. Ew rewşa ku dibe sedema vê ku ew di gel heqîqet û rastiyan berbirû bibin û lerizîna sitûnên koşka şik û gumanên bixweçêkirî bibînin.

Urmiye wekî yek ji bajarên Kurdistanê her ji mêj ve wargehê bi hev re jiyana xelkên cur bi cur, bi olên cur bi cur ve bûye. Li rex Kurdên vî bajarî, Azerî, Asûrî, Ermenî, Cihû û peyrewên Ehlê Heq bi hev re jiyan kirine.

Ji tu kesî veşartî nine ku ew bajar cihê jiyana Kurdan bûye, ew Kurdên ku rabihuriya jiyankirina wan di herêmên Mezopotamya û felata Îranê de vedigere bo hezaran salî berî niha, û bi awayekî mirov dikare de'îya vê hindê bike ku xelkên herî xwecihî ên vê herêmê bê guman Kurd in.

Mirovên vê herêmê ew in yên ku wek çiya li hemberî bahoza jînosaydê û şîpelên xwînê de sekinîne û bi wan bahozan jinav neçûne.

Dîrok û rûpelên rastîn ên wê, şahidê vê rastiyê ne ku Kurd ne kesên şerxwaz, û ne jî kesên êrîşkar bûne, belkî di warê berevanîkirina ji welat û kerameta mirovî ya xwe, şervanên herî navdar û di warê bergirîkirina ji nîştimana xwe her di serdemên kevnar de, navê wan li ser zar û zimanan bûye, û hertim xwîna xwe goriyê mana netewe û nîştimana xwe kirine.

Di wan rojên dawiyê de em şahidê hinek êrîşan li dijî Kurdên Urmiyê bûn. Vê carê ne ji aliyê şovenîzma nawendxwaz, belkî ji aliyê zarokê na xelef yê vê tevgerê, wate tevgera pan turkîstî, ku yan dersxwanê xwengeha Axûndê canî Mele Hesenî û yan jî tewawiyetxwazên kirêgirtî ne. Hêceta wan jî posta parêzgariya parêzgeha Urmiyê û propagendeya danîna yek ji Kurdan di vê postê de bû, Kurdek ku ne nûnerê xwestek û daxwaziyên neteweya Kurd e, belkî kesek e bi nasnameya girêdayîbûna bi tevgera bingehxwaz a hikûmetî.

Destên pişt perde cardin toyê nakokiyê çandin û hinek şevnameyên faşîstî di nava bajarê Urmiyê de bilav kirin. Ew şevnameyên ku fetwaya biyom ya cîhada Xomeynî li dijî neteweya Kurd di destpêka şoreşê de tîne bîra me.

Ew şevnamenûsên ku li hemberî hişikbûna gola Urmiyê û guherîna wê golê bi çavkaniyên xwê, rehet û asûde rûniştine, û heta tenê amade ninin ku peyva "gazinde" li hemberî zuhabûna gola Urmiyê de bi kar bînin, niha çi qewimiye ku dîsan şûrê cesûriya xwe li dijî xelkê Kurd derxistine?

Ew Kurdên ku bê guman meztirîn goriyên cînayetên rejîma nawendxwaz in. Kurd û neteweyên din ên akinciyê urmiyê û bi taybetî Azerî bi sala ye ku di vî bajarî de bi hev re jiyanê dikin, û Kurdan jî tu carî êrîşî ser mafên wan nekiriye.

Lê gelo çima şevnamenûs Urmiyê jî wekî Kerkûk û Qerebaxê dihesibînin, ew yek eşkere ye û mirov dikare ji du dîtingehan ve bersiva vê pirsê bide.

Ya yekemîn ew e ku ew şêweya propagendeyê hemen siyaseta kevn ya "Nakokî û netebahiyê bêxe navberê û bi xwe jî deshilatdariyê bike" ye, ku bi salan e di gotara navendxwaziyê de ew yek xûya dike. Yan jî nûserên wan şevnamenûsan xwe baş nas dikin û bi baştirîn şêwe, faşîzma cihgirtî di mejiyê xwe de zelal û eşkere kirine ku di rastî de ew şêwe dîtingeha di cîhana îro de ne tê qebûlkirin, û ne jî akinciyên Urmiyê çi Kurd û çi jî xeyrî Kurd vê yekê qebûl dikin.
Lihevhatina di navbera Komara Kurdistan û Hikûmeta Neteweyî ya Azerbaycanê di sala 1325 (1946) de, paradaymeke bona bi hev re jiyana Kurd û Azeriyan di Urmiyê û bajarên din ên Kurdistanê de, ku ji bilî Kurdan xelkekî din jî tê de jiyan dike. Ji bilî vê yekê baskirina ji her cure gelaleyeke tewawxwazane tenê dikare gumanek be ku mejiyê afirînerê vê gelaleyê di nava cîhana xewn û xeyalan de bihêle.

Her pêngavhilgirtinek di warê bidestveanîna mafê neteweyên belengaz û zulimlêkirî di Îranê de û demokratîzekirina hikûmetê bê guman hewcehî bi hevkarî û lihevkirinê û bi fermînasîna mafên yektir e, ji bilî vê yekê tu îdiayek nikare bibe xwestekek rewa û encameke pozetîv hebe.

Aştiya erênî bo neteweyên akincî di Îranê de pêwendiyeke du alî di gel tabkirina hevdu heye û ew tabkirin nikare bi berçavnegirtina mafên destpêkî ên aliyê hember bihê cîbicîkirin. Li ser vê bingehê reftar û helwesteke weha tenê dikare avê berde ser aşê hikûmeta navendî, û temenê deshilata gotara navendxwaz dirêj bike.

Îran û Sûriye û Konferansa Jinêva duyemîn

W:Mo'tesem Noranî

Pêwendiyên Îran û Sûriyê vediger in bo berî şerê Îran û Îraqê, bi taybetî di dema şer de wekî du hevalbendên sitratejîk hevkariya Îran û Sûriyê berdewam bû. Hêdî hêdî di wan salên dawiyê de ew pêwendî gihîştine kopka xwe.

Pêkanîna bereya berxwedanê ji aliyê Îran û Sûriye û hizbullaha Lubnan û piştevaniya rasterast ya Îranê ji Sûriyê û Hizbullahê beşek ji vê sitratejiyê ye ku Îran bona bihêzkirin û dirêjîpêdana deshilata xwe dijî Amerîka û Rojava û Îsraîlê mifahê jê distîne.

Piştî serhildanên Buhara Erebî û şerê navxweyî yê Sûriyê, Îranê bi eşkere helwesta xwe diyarî kir û bergirî ji rejîma Beşar Esed kiriye û neyarên rejîma Esed jî weke terorîst binav kirine, û ji riya Hizbullahê ve çek û teqemenî û alavên şer şandine Sûriyê û helwesta wê zelal e.

Lê piştî hilbijartina Hesen Rûhanî weke serkomarê Îranê, piraniya çavdêrên siyasî li ser vê baweriyê bûn ku Rûhanî dikare hem di siyaseta derve û hem jî di navxwe ya Îranê de, guherînên berçav pêk bîne.

Di rastî de Hesen Rûhanî du astengên sereke li ser riya wî hene. Ya yekemîn deshilata bê gotin ya Elî Xamineyî rêberê Îranê ye, û ya din jî deshilata Sipaha Pasdaran e, lewra zehmet e ku Ruhanî bikare balansa di navbera wan du deshilatan de ragire û karên xwe ber bi pêşve bibe, ji ber ku Sipaha Pasdaran a şoreşa Îslamiya Îranê dewletek taybetî di nav dewleta Îranê de pêk aniye. Rêkxirawên taybet bi xwe hene û bi ser şademara aboriya Îranê de zal e.

Ji vê yekê jî girîngtir tayê derve yê Sipaha Pasdaran e ku wekî Sipaha Quds hatiye naskirin û weke kolonî û jêr destê Îranê dinihêre Îraq, Lubnan û Sûriye û bi tewahî xwe xistiye nava wan welatan de, û destêwerdana di nava karûbarên wan de dike, û bi vî awayî li Îranê hinek belge di dest de hene ku li hemberî Amerîka û Îsraîlê mifahê ji wan distîne.

Heta rêber jî piştî gotûbêja telefonî ya Hesen Rûhanî tevî Obama nerizayetiya xwe eşkere kir, bona vê ku nîşan bide tenê ew dikare axavtina dawiyê bike, û Rûhanî bê deshilat e.

Digel vê yekê jî Rûhanî jî di warê siyaseta Îranê û karûbarên Derve de, bi taybetî di warê Sûriyê de her vê yekê dibêje ku pêştir hatine gotin, û heya niha tu tişteke nû negotiye. Ji aliyeke din ve mirov nikare weha bi hêsanî çavnihêrê vê be ku Rûhanî bikare siyasetên derve ên Îranê biguhere. Di vir de pirsyarek tê holê, gelo wî di bingeh de bawerî bi reforman heye yan tenê eva qise ne ku dike?.

Guherîna siyasetên derve ên Îranê derheq Sûriyê û Îraq û Lubnan û welatên Kendavê û Yemenê herwisa hêsan nine. Jiber ku Komara Îslamî bi dirêjahiya 35 sal temenê xwe kar dike li ser wan dewletan û ji rêya Hizbullaha Lubnanê ve dest dixe nav karûbarê Sûriyê û dirêjiyê bi kuştara xelkê zulmlêkirî yê wî welatî dide.

Opozisyona Sûriyê, Îranê bi aliyeke şerê navxweyî li Sûriyê dizane. Îran bi awayekî çalak nakokiyek kûr û berbilav dixe navbera Şî'e û Suniyên welatên herêmê û bona hilweşandina wan welatan bi berdewamî bername û pîlanan dadirêje û ev siyasete jî rasterast di xizmeta Îsraîlê de ye.

Şerê navxweyî yê Sûriyê gehiştiye qonaxeke pir metirsîdar e. Karbidestên paye bilind ên Komara Îslamî li ser vê baweriyê ne ku, şerê malwêranker ê Sûriyê dibe li ser destê Îranê bi dawî bê. Heta niha ku qirare di heyamê çend rojên din de konfransa Jineva duyemîn birêve here.

"Dibêjin konfranasa han bê beşdariya Komara Îslamî tu encamek nabe û Komara Îslamî weke yek ji welatên girîng ên herêmê dikare bandorek berçav hebe. Îran dikare di herêmê de dawiyê bi xwînrêjandin û kuştarê bîne. Kêşeya Sûriyê bê hevkarî û piştevaniya Îranê çareser nabe".

Rast e ku karbidestên Îranê dibêjin hebûna Îranê di konfiransa Jinêva dûyemîn de hewce ye, lê Amerîka dibêje ku Îran bi şertekê dikare di vê konfransê de beşdariyê bike ku encamên konfransa Jinêva yekemîn ku roja 30.06.2013 hat lidarxistin qebûl bike. Ew jî ev e ku kêşeya Sûriyê ji rêya dîplomasiyê ve bê çareserkirin û di demeke nêzîk de dewleteke nû bê avakirin û Beşar Esed tê de beşdar nebe.

Eva di demekê de ye Îran tu dewletekê qebûl nake ku Esed tê de beşdar nebe. Heta xanima "Marî Harf" berdevka Koşka Sipî ragehand ku Îran wî çaxî dikare beşdar be ku kakila rêkkevtinnameya Jinêva yekemîn qebûl bike. Ji aliyek din ve dijberên Esed bi mercekê beşdariyê di konfransê de dikin ku biryara vêdebirina Beşar Esed yek ji xalên vê be.

Çavkanî: www.economist.com

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî

Qadir Îbrahîmî naskirî bi Mamosta Qadir kurê Xidir, sala 1346'an(1967) li gundê Bêwran a Serê, ser bi bajarê Serdeştê tê dinê.

Qadir Îbrahîmî derheq nasiyariya xwe û PDKÎ weha dibêje: "Sala 1358'an(1979) min li xwendingeha şevê li Rebetê ders dixwend, wî çaxî bajarên Kurdistana Rojhelat di destê Komara Îslamî de bûn û gund û çiyayên Kurdistanê jî di destê PDKÎ û hêzên din ên Kurdî de bûn.

Mamê min bi navê Mihemed Îbrahîm di gundê me de kadrê navçê bû, û Yekîtiya Lawan ava kiribû. Rojekê dema em li xwendingehê vegeriyane mal, mamê min daxwaz ji dersxwanên Bêwrana Serê kir ku di Yekîtiya Lawan de ku wî çaxî bi "Rêkxirawa Cewanan" dihat naskirin kar bikin, me daxwaza wî qebûl kir û dest avête karê rêkxistinî û piropagendeyî.

Piştî du salan, wate di sala 1360'an(1981) de, ez di dewreya kadriya Lawan de beşdar bûm, û piştî midehekê dîsan di dewreya "Terbiyet Mo'elimî" de beşdar bûm û di gundên derdora Serdeştê de min dest avête wane gotinê, û ez bûme mamostayê şoreşê. Bi vî awayî min PDKÎ naskir".

Mamosta Qadir tevlîbûna xwe bi PDKÎ re weha tîne ziman: "Sala 1362'an(1983) piştî xwe rêkxistinek baş Komara Îslamî êrîş anî ser gundên Kurdistanê û cardin gund dagîr kirin. Se'îd Kwêstanî ku wî çaxî berpirsê Komîte Şaristana Serdeştê bû, civînek li avahiya komîtê de pêk anî û têde ragehand ku, gund ji dest me derketin û me tu xwendingeh neman ku hûn têde waneyan bêjin, lewra ez daxwazê ji we dikim ku, herkes dixwaze bibe pêşmergê partiyê û her kes jî naxwaze dikare vegere mala xwe.

Tenê min û Husên nazdar û kesekî din daxwaza komîtê qebûl kir û bi awayekî fermî jî, ji wê rojê ve ez bûme pêşmergê PDK Îranê".

Qadir Îbrahîmî roja her xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Cejna Newroza sala 1368'an(1989), li hola giştî a PDKÎ li Bolê amadekarî bona cejnê hatibû kirin, Dr. Qasimlo hat û peyamek ji pêşmergan re pêşkêş kir û got, rojnamevanekê li bajarê Mihabadê ji min pirsyar kir ku hûn kengî wê vegerin Kurdistana xwe? Min jî di bersivê de got, 25 salên din. Lê niha ez mizgîniyê didim we ku, em wê di demek gellek kurt de cardin vegerin ser axa xwe û bi azadî jiyana xwe bidomînin.

"Em li hola giştî a Komîte Şaristana Serdeştê li "Kunemar"ê bûn û firavîna me goşt bû, ji nişkê ve RDKÎ mûzîkek xemgîn belav kir û piştre nûçeya birîndarkirina Dr. Qasimlo xwand, wê rojê tu kesî firavîn nexwar û her kesekî di cihê xwe de rondikên hesretê barandin".

Gellek kadr û pêşmerge ji armanca gotinên Dr. Qasimlo fam nekirin, lê min zanî ku merema wî gotûbêj û danûstan tevî Komara Îslamî bû. Mixabin bo wan gotûbêjan çû û tu carî bi saxî venegriya Kurdistanê.

Newroza wê salê roja herî xweş a jiyana min bû, jiber ku min yekem car bû rêberê xwe didît û herweha mizgîniya vegeriyanê jî da me".

Qadir Îbrahîmî di hember de jî roja herî nexweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Em li hola giştî a Komîte Şaristana Serdeştê li "Kunemar"ê bûn û firavîna me goşt bû, ji nişkê ve RDKÎ mûzîkek xemgîn belav kir û bi dû re nûçeya birîndarketina Dr. Qasimlo xwand, wê rojê tu kesî firavîn nexwar û her kesekî di cihê xwe de rondikên hesretê barandin, ew roj gellek nexweş bû û tu carî ji bîra min naçe û herdem weke fîlmekê tê pêş çavên min".

Mamostayê şoreşê Qadir Îbrahîmî derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje: "Sala 1383'an(2004) li "Zewiye Sipî"(Nawenda 2'ê y a Kurdistanê), min tevî xanima xwe Xanzad ku Kurdê Kurdistana Başûr e, jiyana hevpar pêk anî, û berhema jiyana me jî du kur in".

Mamosta Qadir di peyamekê de ji Partiya Demokrat û xelkê Kurdistan re dibêje: "Remza serkevtina me di yekrêzî û yekgirtina me Kurdan de ye, lewra ez di despêkê de daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikim ku hertim yekgirtî bin û yekrêziya xwe biparêzin û paşan daxwazê ji PDKÎ dikim ku her weke di dîroka avabûna xwe de selimandiye ku hertim berjewendiyên xwe gorî berjewendiyên giştî û netewî kirine, niha jî bona yekxistin û yekrêziya Kurdan, hewla lihevhatin û yekrêziyê di navbera hêzên Kurdistana Rojhilat de bide".

Mamosta Qadir bi vê gotinê hevpeyvîna xwe bi dawî tîne: " Ez weke xwe vê karê rojnameya Agirî bi karek baş û zêrîn dinirxînim û hêvîdarim ku medya û belavokên din ên partiyê jî karek weha bikin û rêzê ji xebat û berxwedana pêşmergên dêrîn bigirin".

Qadir Îbrahîmî û hevjîna wî

Roja cîhanî ya nehêlana hejariyê

Hîwa Mîrzayî

Jiyana xweş û bidestxistina xwarinên baş û şiyana kirînê, yek ji mafên herî despêkî ên her mirovakî ye di civakê de, lê mixabin niha parek berçav ji akinciyên cîhanê bi sedema hejariyê dinalînin û dahata rojane ya wan pişka dabînkirina xwarinek baş nake.

Herçend di dehsalên derbazbûyî de bona jinavbirina hejariyê hewlên berçav hatine dayîn, lê li gorî gotinên "Cîm Yong Kîm" berpirsê banka cîhanî, nêzîk bi 1 milyard û 300 milyon kes ku 400 milyon ji wan zarok in, di bin ewqasê hejariyê de dijîn û nêzîk bi 7 milyon zarok jî ku temenê wan di bin 5 saliyê de ne, salane canê xwe ji dest didin.

Zêdebûna hejariyê di civakê de vedigere ser siyasetên nebaş û ne zanistî ên deshilatdarên bi ser civakê de û, welatê Îranê jî ku yek ji wan welatan e ku di warê jêrxana aborî de, welatek dewlemend e û bi sedema hilkevta coxrafî û rewşa seqayê ve, dikare bibe welatekî torîstî û geştiyarî û eva jî dikare bibe sedema dahatek zaf bo xelkê wê, lê siyasetên ne zanistî û nebûna programên serdemiyane ên aborî û herweha dizîn û bi talanbirina dahata petrola Îranê ji aliyê deshilatdaran ve û, alîkariyên berçav ên Komara Îslamî ji hêzên binajoxwaz û terorîst re û, herweha hewldan bona bidestxistina çekên etomî û dijatî tevî cîhanê, bi taybet welatên rojavayî û li serveyî hemûyan welatê Amerîkayê bûye sedema vê ku, hisarên aborî bi ser Îranê de bên sepandin û hêla hejariyê bi awayekî berçav bilind be.

Li gorî nawenda amara Îranê, rojane 48 milyon kes di Îranê de mûçeyek kêmtir ji 4 hezar û 300 Tûmenî werdigirin û herweha nêzîk bi 10 milyon Îranî jî di bin ewqasê hêla hejariyê de ne, û nêzîk bi 30 milyon kes jî bi destê hejariyê ve dinalin.

Eva di demekê de ye ku li gorî çavkaniyên olî, gerek dahata welat bê ferq û cudahî di navbera takên civakê de bê parvekirin, lê weke em dibînin dahata Îranê ji aliyê bandên mafiyayî ên weke Sipaha Pasdaran û karbidestên payebilind ên rejîmê ve tê birin û para xelkê Îranê jî ji vê dahatê, tenê hejarî û bêçareyî ye.

Bêkariya pitir ji sê milyon kesî bûye sedema kirzê di Îrane de

Nûçegehaniya Mêhrê ragehand ku li gorî amarên dawiya sala 1391'an(2012), nêzîk bi sê milyon bêkar di Îranê de hene, ku ji vê rêjeyê nêzîk bi 1 milyon û 300 hezar kes xwendekar û derçûyên zanîngehan in.

Eva di demekê de ye ku wezîrê kar yê Komara Îslamî eşkere kir ku %43 ji xwaziyarên damezirandinê di Îranê de, derçûyên zanîngehan in û eva jî bûye sedema kirîza bêkariyê di Îranê de.

Herweha nawenda amara Îranê ragehand ku, di heyamê serkomariya Ehmedî Nijad de, navbera nirxa bêkariya lawan û nirxa bêkariya giştî di Îranê de %10 bûye.

Şer û birçîbûn sedemên awarebûna xelkê Sûriyê ne

Çend fitwayek Olî, ku li mizgewtên derdora bajarê DÎmEşqê li bin destê Opozisyonê derçûn, rê didin ku ev goştên ku di Ola Îslamê de heram kirine, bixon.

Di şirîtek Vîdyoyî de ku di vê dawiyê de hatiye bilavkirin, hejmarek kesên olî dêjine xelkê derdora bajarê Dîmeşqê ku bo nehêlana birçîbûnê rê didin ku goştê pişîk, Se û Ker bixon.

Ev fitwa bi sedema wê ye ku ev devere di bin destê Opozisyonê de hertim ji aliyê hikûme ve tê bombebaran kirin ku ev jî dibe rêgir li hember gihîştina xwarin û pêdviyên rojevê bo xelkê vê deverê.

Kesê olî dêje ku fitwaya wan wek daxwazeke alîkariyê ye ku hemû cîhan bo wan alîkarî bişînin û dêjin heke rewşa han bi vî awayî dom bike, bi vî awayî zîndîwer jî neçar in ku goştê miriyan bixon

Ferzane Xosrewî

Hevpeyvîn: Îdrîs Sitwet

Pirs: Ferzane Xosrewî kê ye?

Bersiv: Ez Ferzane Xosrewî (Rêjaw) keça şehîd (Behram Xosrewî) xelkê Kurdistana rojhelatê li bajarokê Serpêlzehaw ser bi parêzgeha Kirmaşan im û niha xwendekar im li Zankoya Selahdîn li beşa Kevnarnasiyê.

Pirs: Dibe tu di despêkê de, bo me hindik basa jiyana Edebiya xwe bikîy?

Bersiv: Ez dikarim bêjim cûrek hîs û xwest û îradeyek di hûndirî mirov de heye ku dibe handanek bo livlivîna xwestik û şiyanên mirovan, ku dibe di her mirovekî de bê çavnihêrîkirin.

Jiyana huneriya min di penaberiyê de serî hildaye û tevlî cîhana huner û rengan bûye.
Di kempekê de ku xincî bedbextiyê pir zehmet bû ku çavnihêriya jiyanekê hatiba kirin ku bêhna jiyanê lê hatiba, pir zehmet bû ku çavnihêriya hêvî û xwestekan hatiba kirin ku xendiqiyê destê vê jiyanê bû di hundira kesan de, bi zarokînî tevî domandina niviya temenê xwe, tevî cîhanek din nasiyar bûm, cîhanek ji reng, tewawkerên beşekê bû li jiyana min.

Ev hunere hin din weha li min kir ku zal bim li ser zehmetiyên jiyanê ku min hêviyek hebe bo pêşerojê. Hingî têgihîştim ku huner tewawkerê jiyanê ye, huner yanî jiyan.

Pirs: Çavan û kengî tu tevlî cîhana wênekêşanê bûyî û Tu tiştek bû sedem ku tu bibî wênekêş?

Bersiv: Ez di zarokî de hînî huner û şêwekariyê bûm, ev jî bi vê sedemê ku bavê min di vî warî de dest rengîn bû û weke mamostayekî bandora xwe li ser min hebûye û bû sedema vê ku ez tevî cîhana hunera şêwekariyê nasiyar bim.
Ji aliyekî din jiyana awaretiyê jî hin din moral da min ku ez bikarim karê xwe ê hunerî bidomînim, çimkî tenê rêyek bû ku min dikarî xemên hundira xwe û jiyana awaretiy xwe ji rêya Tabloyên xwe ve nîşan bidim.

Pirs: Heya niha te çend pêşangeh di kurdistanê de vekirine?

Bersiv: Heya niha min nêzîkî pênc pêşangeh vekirine. Min bi alîkariya Yekîtiya ciwanên PDKÎ kariye du pêşangehan vekim, û herwûsa bi alîkariya rêkxirawa Yekyetiya Jinan (Xaneqîn) pêşangehek û li kolêja edebyatê li zankoya Selahedîn pêşangehek û dawîn pêşangeh jî li sentera Gencên Koyê bû.

Pirs: Çalakiyên te ên wênekêşanê heya çi qasî di nav civakê de bandor hebûye?

Bersiv: Şik di vê de nine huner her di kevn de dewr û bandora xwe li ser mirovan hebûye.

Heke em mêze bikne tabloyên kesê şêwekar, em dikarin ji rêya tabloyan bi hêsanî heya qasekê hundira xwediyê hunerê bixwînîn û berevajiyê kesekî hozanvan ku ji rêya helbestên xwe ve ya di dilê xwe de eşkere dike
Ez jî weke keçeke şêwekar dikarim bêjim tabloyên min bûne nsname û teibîrek bo hundira min.

Xincî vê ku min ciwaniyek taybetî ji rêya tabloyan ve bexşiye derdora xwe û min kariye wan dilxweş bikim, hin din jî bûme sedema vê ku zêde kesan bi dîtina tabloyan han bidim ên ku hez ji vî karî dikin.

Pirs: Dibe wênekêşek çi taybetmendî hebin?

Bersiv: Ev hunera ku heye, bi milkê xwe nezane belkî ew tablo milkê civak û neteweya wî ye. Hunera xwe li xizmeta xelkê xwe danê û çavnihêrî û rexne û pêşniyarên derdora xwe qebûl bike û bikare bi xalek reş li ser kaxeza sipî dilxweşiyê bêxîne dilê pir kesan.

Pirs: Bi bawera te çima jinên kurd bi awayekî hewce nekarîne tevlî hunerên han bin?

Bersiv: Derheq têkelnebûn û nêzîknebûna pêdivî ên jinên kurd bi hunera şêwkarî, renge çend sedemek hebin ku bûne rêgir di hember wan de, aliyên civakî di civaka me de ku zaf tişt bo vê yekê dibin ku mirov mifahê jê werbigire ku di civaka me de bi “Eybe” dizanin, huner jî yek ji wan aliyane ku bi eyb û qedexe û karek guneh tê zanîn.

Pirs: Tu di cîhana wênekêşanê de fêrî çi bûyî?

Bersiv: cîhana wênekêşanê ez hînî wê kirim ku huner afirandin ji alî xwezayê ve ye, û tewawkerê beşekê ji jiyana her mirovekê ye, hunera şêwekariyê û rengdan bi jiyanê ye, û cîhaneke ji reng, ku her yek ji wan rengan mana û bêhna jiyanê ji wan tê û weha li min kiriye ku ez vê cîhanê li dîtingeha huner ve mêze bikim.

Pirs: Gelû tu wênekêşanê di nava civaka kurdan de di çi astekê de dibînî?

Bersiv: Her çend hunera wênekêşanê pêka hunerên din di astekê baş de nine lê serbarê vê jî di civaka Kurdewarî de me kesên birûmet û hunermendên mezin hene ku di warê şêwekarî de şaraza û hêjayê wê ne ku rêz jiwan bê girtin.

Pirs: Pilanên te bo pêşerojê çine?

Bersiv: Bi vê hêviyê ku heke alîkariya min bê kirin min piroje bo pêşrojê hene ku şêwazeke din bi hunera şêwekariyê zêde bikim ku cudatire ji caran û karê “Bizmar” bikim û li cihê rengan, bizmarê bi kar bînim û karê bizmarê jî taybet dibe bi kesayetiyên binavûdeng ên kurd.

Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî

Dijminê aqilmend ji hevalê xayin çêtir e :
Dijminê aqilmend li gor jiyanê difikire û herwiha mirov jî biaqil bifikire mirov dizane dê dijminê mirov çibike. Lê dijminê herî mezin ku li ba mirov xuya bibe û xayîn be,jixwe mirov dibêje heval e, lê mirov nizane dê xayîntiyê bi mirov bike. Herwiha di nava mirov de kli mirov dixe.

Dijminê ardûyê xwe dostê nanê xwe ye :
Ardû ji bo nan çêbibe mirov wî dişewitîne,dema nirov ardûyê xwe pir bişewitîne tê wê watеyê ku mirov li tenduristîya xwe miqate ye an mirov ardûyê xwe dişewitîne ji bo nanê xwe ye. Dema mirov mesrefê bike di jiyanê de jî heke mirov wê mesrefê jibo bingeha tiştekî bike baş e û mirov çiqas mesrefê an xebatê bike baş e.

Dijminê bava nabin dostê lawa:
Ev gotineke feodalî ye. Jibo dozên xwînî hatiye gotin. Mirovek dijmine bavekî be jixwe nabe dostê lawê wî jî. Kî dibe bila bibe ji dijminre law bav ap pismam yek e.

Dijminê biaqil ji dostê bêaqil çêtir e:
Dostê bêaqil mirov li teşqeleyan diqewimîne û sûdeya wî ji mirov re tune ye.Lê dijminê biaqil mirov dizane wê çibike ,herwiha dijminê biaqil li gor rê û rêbazên jiyanê tevdigere.

Dijminê dijwar ji dostê xayin çêtir e:
Ev jî wekî dijminê aqilmend ji dostê xayîn çêtir e. Lê hinekî cûdatî tê de heye.Wekî ku dijminê pir dijwar be mirov jî xwe li himber wî dijwar dike an mirov li gor wê yekê devdîrên xwe çêdike.



Şaristana Dêhloran

A: îdrîs Sitwet

Şaristana Dêhloran yek ji şaristanên parêzgeha Îlamê ye û nawenda vê şaristanê jî Dêhloran e. Şaristana Dêhloran ji sê bexşan pêk tê bi navên:

1- Bexşa Merkezî
2- Bexşa Zerînawa
3- Bexşa Mosiyan

Li gor serjimêriya sala 1390'î (2011) heşîmeta vê şaristanê 66.399 kes bûye û Şaristana Dêhloran ji rojava tevî dewleta Îraq, ji başûr tevî parêzgeha Xûzistan, ji rojhelat tevî şaristana Abdanan, ji bakûrê rojhelat tevî şaristana Bedre, ji bakûr tevî şaristanên Melikşahî û Mêhran hevsînor e û akinciyên vê şaristanê kurd in û bi zimanê kurdî û bi devoka Lorî dipeyvin.

Rûberê şaristana Dêhloran 6229 KM e, ku yek ji sê ya rûberê hemî parêzgehê pêk tîne û piraniya rûberê vê şaristanê jî deşt e, wek Deşta Berteş, Dêhloran, Beyat, Mosiyan û Deşta Ebas û axa vê jî baş e bo cotkariyê, û zêde av jî heye, û çendîn rûbar jî ji vê deverê re derbaz dibin, wek: Rûbarê Duborc, Mîme, Semîre (Kerxe), Sêglan, Doşe, Nîzar û Çîxab û av û hewayê vê deverê pir xweş e.

Şaristana Dêhloran derbazbûyek kevn heye û yek ji deverên herî girîng yê parêzgeha Îlamê ye û ev bajare û deverên derdora vê wek Elîkûş, Çixa sifîd, Mosiya û Zerînawa ku derbazbûyek zaf kevnar heye û şûnwarnasan tenê kariye hindik ji raz û remzên vê deverê eşkere bikin, ji ber ku pir deverên din wek Gurgowro, Kelate û kelha şewaq û cihên din di vê deverê de ku di warê dîrokî de pir giranbûhaye û pêdivî bi vekolînek bingehî heye û piraniya şûnwarên vê deverê vediger in bo dewrana nûsengî, belkî ev devere yek ji wan deveran be ku di dîroka mirovahiyê de civak li vir pêkhatibe.

Vekolînên ku di vê deverê de hatine encamdan, nîşan dide ku mirovên vê deverê 8000 hezar sal berî zayînê ji du xwarinên wek dexl û ceh, û du rihliber jî wek bizin û mîh mifah wergirtine.

Em dikarin amaje bi vê yekê bikin ku kevnarnasên mîna "Marsêl Dîwlafoa" û hevjîna wî "Cîn" li salên 1884 heya 1886'an li tepika Mosiyan û "J. A. Gotye" û "J. Lambir" di sala 1913 de pitir ji du mehan vekolîn di tepika Mosiyan de encam dan û herwusa hin ceribandin ku "Firank Hol û Kênt Wî Filanrî" di sala 1961'an de li ser tepikên Elî Kiş û Çixa Sipî û cihên din di vê deverê de kirin, vê rastiyê nîşan dide ku 5500 heya 7500 hezar sal berî Zayîn akinciyên vê deverê kewî kirin û xwedî kirina malatên wek çêlek û çandina giyayên xwarinê wek Nîsk û maş çandine û mijûlî cotkarî û terşdarî (Heywandarî) bûne û heya qasekê dest bi jiyana dewreyî û bi kom kirine, vekolînên ku li derdora Dêhloran hatine kirin, eşkere dike ku jiyana gundnişînî di vê deverê de vedigere bo deh hezar sal berî Zayînê û gundiyên vê deverê ji rêya cotkatî û terşdarî (Heywandarî) û rawkirinê bijîva jiyana xwe bidest anîne.

Hêjayî gotinê ye ku li gor vekolînên şûnwarnasên Feransewî akinciyên deverên Dêhloran rolekek berbiçav li: Destpêka avdêrî bo cotkarî û destpêka kewîkirina malat (çêlek) an de hebûne.

Li gor vekolînên şûnwarnasan û civaknasan ku di deverên curbicur de hatîne encamdan, şêwaza koçnişînî, şêwaza herî destpêkî ya jiyana mirov bûye û bi gotina kevnarnasan û vekolînên ku hatine encam dan, belkî devera Dêhloran yekem dever be ku bi vî awayî jiyan kirine, devera Dêhloran pêka deverên din ên seraserî Îranê, yek ji nawendên herî pêşketî bo cotkariyê bûye.

Cihên geryan û kevnar ên Şaristana Dêhloran pêk tên ji: Kelha Şiyax, Kelha paqfele, Kelha Kûrêçika, Kelha hejîr, Bajarê dîrokî yê Samra,T Elîkûş, Mosiyan, mihemed Ceifer, Moradawa, Ketîbeya Mîme,
Agirdana Mîme, Dînar kûh, Sûlava Abtaf, Ava sarkûh, Mormorî, Şikevta "Xofaş" (çekçekûle) û kaniya ava germ û ....hwd.

AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

Diz ketne mala dozger û dosya dizîn

Li gor nûçeyeke Rojnameya "Yeni ozgur Polîtîka",çend kesên ku nasnameya wan ne diyar bû bi hêsanî ketin mala dozgerê vekoler yê doseya terorkirina her sê jinên siyasetmedar yên Kurdistanê Sakîne Cansiz,Fîdan Doxan û Leyla Şaylemez li bajarê Parîsê û Laptopa dosyayên dozger dizîn.

Li gor wê nûçeyê kesên diz bêyî ku ziyanekê bigehînin mala dozger yan jî şopa tilîyên xwe bihêlin tenê Laptopa taybet ya vekolînê dizîn. Di demek beriya niha de malbata her sê jinan serdana ofîsa berpirsên Fransî kiribûn da ku bizanibin gelo vekolînên dadgehê derbarê doseya terorkirina keçên wan temam bûne yan na, lê dadgehê daxwaz wan pesend nekiribû.

Keça xwe bo kirîna mobaylekê firotin

Polîsê Çîn, du hevjînên genc, bi sedema vê ku keça xwe li hemberî wergirtina perê mobîleke ayfonê firotine, destbiser kir.

Rojnameya "Azadî" a Çînê di vê derheqê de nivîsand ku wan her du hevjînan li malpereke înternetê propagende bo firotina keça xwe kirine.

Wan daxwaza 4600 dolarî kiribûn, lê heya niha ne diyar e ku wan çiqas pere di vê derheqê de wergirtine, lê wan hem mabîla ayfonê û hem jî çend cot solik ji xwe re kirîn.

Wan di lêpirsîna polîs de gotine ku wan xwastiye ku keça wan jiyaneke baştir hebe. Di Çînê de hebûna zarokan sînordar e, û gellek hemwelatî zarokê xwe yê duyemîn difiroşin.

Ew xwarinên ku bêhneke nexweş çê dikin

Lêkoleran eşkere kiriye ku hinek xwarin digel vê ku ji bo tendurustiya mirov pirr baş in, lê dibne sedema vê ku bêhneke nexweş ji leşê mirovan bê, wek:

1-Xwarina şirîniyan, bi sedema vê ku şekir pirr têde heye, bi hêsanî di madê mirovan de hel nabe, lewra bêhneke nexweş çê dike.

2-Tevî vê ku masî û hêke pirr baş in, lê piştî xwarina masî û hêkê divêt mirov gellek lîmoyê bixo, da ku bêhna nexweş nemîne.

3-Herweha xwarina xwê jî bi rêjeyeke zaf bêhnek nexweş çê dike.

4-Xwarinên gazdar û vexwarina qehweyê jî pêkînerê bêhnek nexweş e.

Çavkanî: arab-lady.com

Mam Husên dixwaze bi simbêlê xwe bikeve pirtûka Guiness'ê

Welatiyê kurd ê bi navê Mam Husên ku wek "Ebû Şewarib" (bavê simêlan) tê naskirin, dixwaze bi simêlê xwe yê dirêj navê xwe di pirtûka rekoran a Guiness'ê de bi cih bike.

Mam Husên xelkê bajarokê Soran ê girêdayî Hewlêrê ye û dirêjahiya simbêlên wî 130 cm e. Mam Husên dibêje, ew ji simêlan ji hemû tiştekî zêdetir hez dike û "Hekî hemû Kurdistanê bidin min, ez simêlê xwe kur nakim".

Mam Husên simbêlê xwe wek nasnameya xwe dibîne û dibêje, derhênerê navdarê kurd Behmen Qubadî jî xwestiye di fîlmekî wî de bilîze lê li gorî Mam Husên, li Kurdistanê naxwaze di fîlman de bilîze.

Ebû Şewarib dibêje eger beşdarî pêşbirke yan jî festîvalekî bibe dê bi navê Kurdistanê beşdar bibe. Sala 1994an agir bi simbêlên wî dikeve û li gorî wî ew bûyer "karesat" bûye û wiha tîne ziman: "Min gelekî xema simbêlên xwe xwar."